Newroz **Hejmar(64)** **Rûpel (7)** **Çirya pêşîn 2005z – 2617k**

Tendirustî

Enflwenza tilûran

Bijîjkê Newrozê

1- Danasîn:
janeke veyrusî ye, bi tilûrên tîmarkirî û yên çolê dikeve, kane bi cureyêne ji dewaran jî keve, mîna berazan. Ew bi riya tilûrên pêketî digihê mirovan.

2- Veyrusa jandar:
ew jî mîna veyrusê mirovane, guhêzok e, kane her demekê xwe biguhêre, ji lewre jî aşla li dijî wê pir caran bê sûd e. Dehûpênc reng jê hene, ji H1 ra H15. Ev veyrus li ba tilûran bê rûdaw e, yan jî bi rudawên sivik derbas dibe. Tenê veyrusên H5 û H7 kane xwe biguhêre, pir xedar bibe, 100% ji tilûran bikuje û mirov jê vegrin.

3 - Ev jan di destpêka sedsala borî de li başûr rojhilata Asyayê hate naskirin, lê di sala 1997 an diyar bû ku kane mirovan jî vegre.

4- Di sala 2004 an de, creyê H5 li başûr rojhilata Asyayê li ba mirîşkan hate dîtin, û hate ragihandin ku çend pêketinên mirovan jê çê peydabûne. Ango, ew veyrus di riya tilûrên nexweş re, bi şêweyên yekser û neyekser kane bigihê mirov.

Çawa mirov janê vedigre: Di riya bêhnkişandinê re, ji bermahiyên tilûrên nexweş û derhênên alav bêhna wan. Ji bilî wê di riya çavan re di riya destgihandê, nemaze di mexberan de. Ta niha nehatiye naskirin ku mirov ji mirov vedigre.

Gengaze kî pir pêkeve?

- mirovên di tîmarkirina mirîşk û tilûran de dixebitin.
- Bazirgan û kesên bi tilûran re dixebitin.

5- Rûdawên nexweşiya Ênfilwenza tilûran:
Mîna rûdawên Ênfilwenzeya tund e: serma, kux, şewata poz û lûlikên bakêşê, dijwariya bêhkişandinê, gerbûna govde tevle êşekên masûlk û mofirkan, westan tevahî.

6- Derman: Dermanekî rasteras nîne, tenê rûdaw tên dermankirin û endamên guvde tên parastin.

7 - Xwevegirtin:
Parastina xwepaqijkirina kesane, mîna pakbûna dest, guvde, keskahî û meywe. Zor girênge ku goşt û hêlînên tilûrên tîmarkirî bixavî netên xwarin

****

Dumahîk : Rastî....Xeman hilmegre , min riya xwe baş naskirî , loman jî weha dikim . Dayê ! Gotina rast dibe bela serê mirov, wî li binê hepis û zîndanan digerîne û dike mêvan , wî penaber û windayî ango serê mirov dişkîne ! Lê dêmariyê , bi hêris dajote ser wî û digote : Bêçaro ! Tu çi dibêjî? Ciqas girîge rastî , eger tehil be jî , divê were gotin û pejirandin .

Wê bi tepan , li serê xwe dixist û gotinên xwe berdewam dikirin , digot: Wey xalî , li serê min bextreşê be, ma gelo ezê , bi çi rûyî herim ber serê, keçikên xelikê û ji vî bûdelî re bibime xwezgêncî ?

Bangîn bi rûkî berkenî , ber ve wê dihat û destên xwe , di ser serê wê re dixuşand û digot : Dayêcan hêdî , xwe pir hêrs meke û mexeyde . Eger tu dixwezî , ez xwedî gotina rast bim û di nava xelkê de serbilidî û bi rûmet bijîm weke tu û pir kesên dî dixwazin , navê Bangînê nezan û bûdele ji ser min rabe, nav û notikên dî li min bibin .

Bangîn xwe ji hevdu radikşand , dengekî blind bi xwe dixst û digot :Jinbav , de ka bersiva min bide , her kes baş dizane vaye bû du sal bavê min , ji malê dû re ; ma gelo ev zikê te roj ji rojê mezintir dibe , ji kû ve û cima! .

Hîngê Dêmarî hers dibe , sola xwe ji ling dike , di serê Bangînê bûdele de lêdixe , xwîn û xirarê bi serê wî ve dadirive .

Ew bi qîj û qêriniyeke bêhempa, ji malê dertê , bi nava gund dikeve . Gundî lê civiyane , hawara wî ye û dibase . gundîno min her tim digot , kesî çima ji min bawer ne dikir , hawar gundîno hawar hele werin hele werin , vaye rastiyê serê min şikand.